



Çalakiyên gel dest pê dikin

Bi pêşengiya KCD, HDP, DBP û TJA'yê bi armanca piştgiyê bidin çalakiyên grevê yên li girtîgehan îro çalakiyên vemirandina lembeyan û dengdaxistinê dest pê dike

HEVSEROKA KCD'ê û parlamenter Leyla Guven ji bo tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were rakirin 48 roj in di girtîgeha Tîpa E ya Amedê de di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ye. Her wiha bi heman armançê li gelek girtîgehan 42 girtî 8 roj in di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ne. Hat ragihand ku komeke din dê sibê li girtîgehan dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger bikin.

@rojname

25 Kanûn - Sêşem 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 215

LI STRASBOÛRGÊ ya Fransayê çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger ku ji hêla 'Înisiyatîfa ji Ocalan re Azadî' hatiye destpêkirin, di roja 9'emîn de ye. Çalakvanan got ku dê li dora Ocalan bicivin. Leyla Guven ji berxwedêrên Strasboûrgê re peyaman şand û wiha got: "Qêrîna ku li Amedê me daye destpêkirin li Hewlêr, Rojava, Rojhilat, Mexmûr û Ewropayê tê bihîstin. Em silavên xwe ji gelê xwe yê li wê derê re dişînin."... RÛPEL - 3

Divê tecrîd bi dawî bibe... RÛPEL- 2



Têkoşîna gel vedibêje

Wênegir û derhênerê kanadayî Joey Lawrence li ser têkoşîna gerîla û şerwanên kurd ên li başûr û rojavayê Kurdistanê, projeyê belgefilmê ku ji sê beşan pêk tê amade kiriye. Lawrence dibêje ji ber ku şahidiya têkoşîna kurdan kiriye, serfiraz e... RÛPEL - 6



Dewleta tirk sûcê navneteweyî dike

Li ser êrişên Tirkiyeyê yên li dijî başûrê Kurdistanê hiqûqnasên bajarê Silêmaniyê diyar kirin ku Tirkiye qetilkirina sivîlan sûcên navneteweyî dike. Hiqûqnasan li hemberî sûcên Tirkiyeyê yên li dijî gelê kurd, banga pêkanîna stratejiyêke neteweyî kir.



Doza sedsalê rekor dişikîne

Li Fransayê kampanyaya li dijî politikayên avhewayê yên hikûmetê hatibû destpêkirin, gihîşt asta rekorê. Heta niha 1,6 milyon kesî mohra xwe daniye binê kampanyayê û tê payîn ku di nav çend rojan de kampanya bigihîje armanca xwe...RÛPEL - 4

Ji ber kurdbûna xwe hat kuştin



SEDEM NASNAMEYA KURDBÛNÊ YE

Di salên dawî de gelek kurd ji ber nasnameya kurdbûnê tên kuştin. Herî dawî di 16'ê kanûnê de li Sakaryayê bav Kadir Sakçı (43) û kurê xwe Murat Sakçı (16) ji ber nasnameya xwe ya kurd rastî êrişê hatin. Bav Kadir Sakçı jiyana xwe ji dest da û Burhan Sakçı jî birîndar bû. Koma ku li kolanê bav û kur rawestandî û gotin 'Hûn kurd in?' ji ber bav û kurê xwe bersiva 'Erê em kurd in' dan, rastî êrişê çekdarî hatin.

WALIYÊ SAKARYAYÊ DEREWAN DIKE

Parlamenter Mensur Işık û Zuleyha Gulum jî di nav de heyetê ji HDP'yan pêk dihat çû mala sersaxiyê û ji malbatê re sersaxî xwest. Işık têkildarî mijarê axivî û wiha got: "Malbatê qala bûyerê ji me re kir. Daxuyaniya Walitiya Sakaryayê derewek mezin e. Çima walitî dixwaze ser vê bûyerê bigire. Di navbera bav-kur û kujer de nîqaşa kurdbûnê derketiye. Ji ber kurdbûna xwe bav hat kuştin."... RÛPEL - 3

Me çi dihesibînin... Nivîsa Ercan Sezgin

R3



Ji bilî PDK'ê hemû partiyên kurd civiyan

Li pêşiya yekitiya neteweyî ya kurdan astengiya herî mezin PDK ye. PDK bi dagirkerên Kurdistanê re hevkarîyê dike û ev helwest dibe sedema nerazîbûnên kurdan. Berpîrsên aliyên siyasî yên Kerkûkê li ofîsa Yekitiya Niştîmanî Kurdistan (YNK) a Kerkûkê li hev civiyan. Ji bilî PDK'ê hemû partiyên kurd beşdarî civînê bûn. Vê civînê jî nîşan da ku PDK dijberê yekitiya neteweyî ye. Di civînê de pîrs-girêkên bajêr hatin gotûbêjirin. Hat ragihandin ku karkirina meclîsa parêzgeh û waliyê nû yê Kerkûkê wê pîrs-girêkên Kerkûkê çareser bike.



Kesêk vengê qêrayîşê ma nêşnavit

Dewa Roboskî de 28ê Kanûna 2011ê de netîceyê bombardumanê teyarananê şerî yê TSKyî de zafê ci doman 34 kesî cuya xo vindi kerdî. Dayîkê ke domananê xo vindi kerdî diyar kerde ke ê fek têkoşînê xo ra vera nêdanî... RÛPEL - 5

Amerîka şî ha!

Şerê Cihanê yê hîrêyine de hem tesadûfî zaf estê hem zî surprîzî. Nê rojanê peyênan de wexto ke serekê DYA vat: "Êdî çî sebeb nîmendo ke hêzê ma Suriye de bimanê..."

Nûşteyê Azad Ararat / R.5





Serokên îstixbaratên Sûriye û Misrê hevdîtin pêk anîn

QAHIRE - Bi dawîbûna şerê navxweyî yê Sûriyeyê re wela-tên ereb hêdî hêdî destê xwe dirêjî Sûriyeyê dikin û bi rejîmê re hevdîtinan pêk tînin. Piştî serdana dîktatorê Sûdanê Omer Beşîr a Sûriyeyê vê carê Şefê Buroya Ew-lehiya Neteweyî yê Sûriyeyê Elî Memluk li ser daxwaza

Misrê serdana Misrê kir. Memlukê ku gelekî nêzî serok-dewletê Sûriyeyê Beşar Esad e bi serokê îstixbarata Misrê Abbas Kamîl re hevdîtin pêk anîn. Hat ragihandin ku Memluk û Kamîl di hevdîtinê de mijarên mîna siyaset, ewlehî û têkoşîna li dijî terorê nîqaş kirine.

Doza sedsalê rekor dişikîne

Li Fransayê kampanyaya li dijî polîtîkayên avhewayê yên hikûmetê hatibû despêkirin, gihîşt asta rekorê. Heta niha 1,6 milyon kesî mohra xwe daniye binê kampanyayê û tê payîn ku di nav çend rojan de dê kampanya bigihîje armanca xwe



Kampanyaya imzeyan a ji aliyê Greenpeace, Oxfam, Weqfa Mirov û Xwezayê (FNH) û gelek rêxistinên din ên civakî yên sivil ve li dijî xemsariya hikûmeta Fransayê ya di mijara avhewayê de hat despêkirin, gihîşt asta rekorê. Kampanyaya ku li ser internetê dest pê kir, weke "doza sedsalê" tê binavkirin û metna wê li ser malpera "laf-fairedusiecle.net" hate weşandin. Heta roja duşemê 1,6 milyon kesî mohra xwe daniye binê kampanyayê.

Armanc ew e ku 2 milyon kes mohra xwe deynin binê metna kampanyayê. Hin hefteyek neqediya hindik maye ku ev armanc pêk were. Di sala 2016'an li dijî reforma kar projeyê bi heman rengî hatibû organîzekirin û di

nava du hefteyan de zêdeyî milyonek mirovan mohra xwe danibûn binî metna vê kampanyayê.


Mîdûra Oxfamê Cécile Dûflot têkildarî kampanyayê got ku kes ji wan ne li bendê bûye ku di demeke ew qas kurt de serkeftineke wiha bi dest bike. Serokê FNH'ê Aûdrey Pûlvar ji diyar kir ku ev seferberî nişan dide ku fikarên li ser cihêrengiya avhewayê û pirsgerêkên der barê cihêrengiya biyo, tirs û fikarên sereke ne.

Rêxistinên civakî yên sivil roja duşemê ji hikûmetê xwestibûn ku bersivê li ser mijarê bide. Qonaxa duyemîn ji ew e ku meha adarê li ser asta Fransayê gilî were kirin û mijar biçe ber destê dadgeriyê. PARIS



Heyetek ji Tevgera Azadî çû Bexdayê

SILÊMANÎ - Heyetek ji Tevgera Azadî ji bo mijara girtina navend û buroyên xwe yên herêma YNK'ê binirxîne, ji Herêma Kurdistanê derbasî Bexdayê bû. Heyet ji Hisên Kerkûkî, Nerîman Ehmed, Ronak Mecîd û Parlamentera Tevgera Azadî ya Iraqê Yûsra Receb pêk tê. Heyet li Bexdayê bi Koalîsyona Sifrê re ku serokê wê Muqteda Sadr e hevdîtin pêk anîn. Heyetê bi koalîsyonê re girtina navend û buroyên xwe nixand û daxwaz kir ku çareseriyek bê dîtin.



Hejmara qurbanîyên tsûnamiyê zêde bû

CAKARTA - Li Endonezyayê hejmara qurbanîyên tsûnamiya ku roja şemiyê ji ber teqîna volkanê Anak Karakatoayê çêbû, zêde bû. Li gorî agahiyên ku ji aliyê rayedarên Endonezyayê ve hatine dayîn hejmara qurbanîyan derketiye 373 kesî û bi hezaran kes birîndar bûne. Her wiha pisporan ragihand dibe ku hin pêlên din jî pêk werin û ji welatîyan xwestin ku xwe ji peravan dûr bixin. Beriya çend salan ji ber teqîna heman volkanî 36 kesan jiyana xwe ji dest dabû.



Şerîf ji nelirêtiyê 7 sal ceza xwar

ÎSLAMABAD - Dadgeha Berpirsariya Malî ya Pakistanê ji ber ku nelirêtiyê kiriye 7 sal cezayê girtîgehê li serokwezîrê berê yê Pakistanê Navaz Şerîf birî. Navê Şerîf di belgeyên nelirêtiyê yên Panamayê de derbas bûbû û ji ber şirketên li ser navê xwe û zarokên xwe ji aliyê Dadgeha Bilind a Pakistanê ve ji serokwezîriyê hatibû dûrxistin. Piştî vê dûrxistinê der barê şirketên li ser navê Şerîf û zarokên wî de dozên nelirêtiyê hatibûn vekirin.



Îsraîl diçe hilbijartinên pêşwext

TEL AVIV - Hikûmeta Îsraîlê ku serokwezîriya wê Benyamîn Netanyahu dike biryar da ku di nîsana 2019'an de li welat hilbijartinên pêşwext pêk werin. Li gorî agahiyên ku ji çapemeniya Îsraîlê hatin wergirtin serokên partiyên ku di hikûmeta koalîsyonê de cih digirin li ser hilbijartinê li hev kirine û li ser vê yekê biryara hilbijartinê hatîye dayîn. Biryara hilbijartinê berdevkê serokwezîr Netanyahu li ser hesabê xwe yê twîterê ragihand.

Wikileaksê amûrên sîxuriya Amerîkayê weşandin

Malpera Înternetê Wikileaks ku ji bo weşandina pevnîsên veşarî yên di navbera welatan de hatiye avakirin, lîsteya amûrên ku sefaretxaneyên Amerîkayê ji bo sîxurtiyê ji Washingtonê xwestine weşand. Wikileaksê ku bi ser navê 'Lîsteya Danûstandinê' amûrên sîxuriyê yên Amerîkayê weşand bi giştî cih da 16 hezar belgeyên tîkildarî van amûrên sîxuriyê yên Amerîkayê.

Wek mînak Sefaretxaneya Kolombiyayê ji Washingtonê daxwaz kiriye ku ji bo sîxuriyê şewqe, berçavk, kamera, sensorên şevê û dûrbînên sîxuriyê xwestine. Her wiha Sefaretxaneya Ukraynayê ji Washingtonê 15 radyoyên veşarî û 20 cihazên denggir ên ji bo çavdêriyê xwestine. Sefaretxaneyek ji ji bo bikaranîna kamerayên sîxuriyê ji sedî zêdetir saet, bişkok, pênûs, şewqe û qrewat xwestiye.

Beriya niha jî belge weşandibûn Wikileaksê ragihand ku lîsteyên hatine weşandin ji raya giştî re vekirine û ji bo gihandina van amûran motoreke lêgerînê vekiriye. Wikileaksê her wiha daxuyand ku raya giştî bi vê yekê dikare xwe bighîne belgeyên vekirî û veşarî yên di arşivên hikûmetê de. Lê li gel vê ragihandina Wikileaksê jî girêdaneke van belgeyan bi malperên înternetê yên sefaretxaneyên Amerîkayê re demeket.

Beriya niha jî Wikileaksê belgeyên bi vî rengî weşandibûn. Bi van belgeyên hatibûn weşandin re gelek tîkiliyên veşarî yên di navbera kes û welatan de hatibûn deşîfreakirin. Ev belge di navbera gelek welatan de bûbûn sedema krîzên diplomatîk û rayedarên gelek dewletan ji ber van belgeyan neçar mabûn ku ji peywirên xwe îstifa bikin. AMED



Fermana vekişînê hate îmzekirin

Serokê Amerîkayê Donald Trump roja 19'ê kanûnê ji nişka ve ragihand ku dê hêzên xwe yên li bakurê û rojhilatê Sûriyeyê vekişîne. Piştî vê biryara ku kes ne li bendê bû di siyaseta derveyî welat a Amerîkayê de krîz derket û Wezîrê Parastinê yê Amerîkayê James Mattis jî di nav de gelek dîplomatên Amerîkayê li dijî biryarê derketin. Li gel vê yekê jî Trump ji ya xwe nehate xwarê û di biryara xwe de îsrar kir. Li ser vê yekê Mattis îstifa kir.

Piştî van nîqaşên durr û dirêj Mattisê ku îstifa kir û hê peywira xwe didomîne fermana vekişandina hêzên amerîkî ya Trump îmze kir. Berdevkiya Wezareta Parastinê ya Amerîkayê tîkildarî mijarê daxuyaniyek da û ragihand ku biryamameya Trump a ji bo vekişandinê ji aliyê Mattis ve hatiye îmzekirin. Dê piştî vê îmzekirinê vekişandina hêzên Amerîkayê ya ji bakurê û rojhilatê Sûriyeyê hat fermikirin û tê payîn ku dê rojên pêş de vekişin



dest pê bike. Li aliyê din beriya vê îmzekirinê Trump û serokkomarê Tirkîyeyê Recep Tayyip Erdogan bi rêya telefonê hevdîtinê pêk anîn. Piştî hevdîtinê Trump li ser hesabên xwe yê medyaya civakî tîkildarî naveroka

hevdîtinê daxuyani da. Trump ragihand ku Erdogan bi gotinên xurt garantî daye wî ku dê bermahiyên DAIŞ'ê yên li Sûriyeyê tune bike. Nehat aşkerakirinê dê Erdogan çawa û li ku derê li dijî DAIŞ'ê têbikoşe! WASHINGTON

Li dijî dostê Erdogan daketin qadan



Li Sûdanê li hemberî desthilatdariya serokdewletê Sûdanê Omer Beşîr ê ku sûtê şer kirine, çalakîyên herî girîng ên 30 salên dawîn tînin lidarxistin. Roja çarşema borî piştî ku hikûmetê bihayê nan 3 qatan zêde kir, çalakîyên protestoyê dest pê kirin. Duh jî sektorên cihê yên pişeyî dest bi grevê kirin.

Protesto heta niha li 10 bajaran belav bûne. Ev protesto wekî nerazîbûnê herî girîng ên çend salên dawîn tê nixandîn. Komîteya bijîşkan a ku di

nav organîzatoran de cih digire diyar kir ku roja sêşemê ew ê daxwazên gel ji serokkomar re ragihînin.

Dewletê ji bo sekinandina çalakîyên protestoyî dest bi tundiyê kir. Li El Gadarefê ya li Rohilata 8 çalakger hatin kuştin û li Atbarayê jî 2 kes hatin kuştin. Hêzên muxalefetê diyar dikin ku bilanço ya rastîn gelekî zêde ye. Li gorî serokê Partiya Muxalefetê Sadîk Mehdi di êrîşên hêzên ewlekariyê de herî kêm 22 kes ha-

tîne kuştin.

Omer Beşîr ê ku serokkomarê Tirkîyeyê Recep Tayyip Erdogan dostê wî ye, ji sala 2010'an ve ji aliyê Dadgeha Cezayan a Navneteweyî ve bi sûtê li dijî mirovahiyê tê sîcdarkirin. Beşîr du caran bû desthilatdar. Niha jî ji bo ku cara sêyemîn were hilbijartin, hewl dide di destûra bingehîn de guherînê pêk bîne. Beşîr ji ber ku ji fonên welat 9 milyar dolar dizîye, tê sîcdarkirin. HARTUM



Têkoşîna kurdan vedibêje

Wênegir û derhênerê kanadayî Joey Lawrence li ser têkoşîna gerîla û şervanên kurd ên li başûr û rojavayê Kurdistanê, projeyê belgefilmê ku ji sê beşan pêk tê amade kiriye. Lawrence dibêje ji ber ku şahidiya têkoşîna kurdan kiriye, serfiraz e

NAVENDA NÛÇEYAN

Çeteyên DAİŞ'ê dema ku derketin, li Sûriyê û Iraqê di nava saetan de bajar dagir dikirin. Tirs û xofa DAİŞ'ê di demeke pir kin de hema hema li temamiya cîhanê belav bû û tu kesî nedikarî pêşî li berfirehbûna DAİŞ'ê bigire. Di vê demê de şervanên kurd, li rojava û başûrê Kurdistanê têkoşîneke bêhempa meşandin û bala hemû cîhanê kişandin ser xwe. Ji bo şopandina têkoşîna şervanan û naskirina wan, ji her deverên cîhanê rojnâmejê, sinemager, derhêner, siyasetmedar û hwd. herikîn rojava û başûrê Kurdistanê. Yek jî van jî wênegir û derhêner Joey Lawrence bû.

Wênegir û derhênerê kanadayî Joey Lawrence di 18 saliya xwe de bi saziyên weke National Geographic Channel û Canon History Channelê re xebitiye. Di heman demê de wênegir gelek kesên navdar ên wek Robert De Niro û Danny DeVito Jennifer Lawrence kişandine. Lawrence niha jî bi projeyên xwe yên belgefilmê û pirtûka xwe ya wêneyan, tê-

koşîna gelê kurd a li başûr û rojavayê Kurdistanê bi raya giştî re parve dike.

Mijarên spesifik dişopîne

Ji ber meroqa wî ya li ser jiyandina cuda, Lawrence li ser gelek mijarên spesifik xebitiye. Ji bajarê Varansi yê li qeraxên çemê Ganjê ku ji bo hindûyan piroze heta Cejna Pîrebokan, gelek projeyên cuda amade kirine. Lawrence bi xebata xwe nîşan dide ku kişandina wêneyekî serkeftî, tenê bi zanîna agahiyên teknîkî ve girêdayî nîne. Di heman demê de girêdan û hezkirina wênegir a bi mijara têkildar re jî girîng e.

Şervanên kurd meroq dike

Herî dawî jî Joey Lawrence ji bo kişandina wêneyên gerilayên PKK'ê û şervanên YPG'ê, 2 caran çûye başûr û rojavayê Kurdistanê bûye. Projeya wî ya Vanity Fair: Italia, Internazionale'yê hate pêşandan û di The Independent's Saturday Magazine'ê de jî weke çiroka bergê hate weşandin.

Perspektîfa şexsî û xweser a şer

Di projeya xwe ya li Kurdistanê de şervanên jin û zilam ên li eniyên şer ên pêş li dijî çeteyên DAİŞ'ê şer dikin, vedibêje. Bêyî astengiyên çapemeniya serdest, bi saya vê projeyê perspektîfa şexsî û xweser a şer pêşkeş dike. Proje ji 3 beşan pêk tê. Di beşa yekemîn ku di sala 2015'an de bi dawî kir, Guerilla Fighters of Kurdistan (Şervanên Gerilayên Kurdistanê) heye.

Beşên duyemîn û sêyemîn

Di beşa duyemîn ku di sala 2017'an de bi dawî kir de Born From Urgency (Çêbûna Ji Neçariyê) û di beşa sêyemîn a ku di heman salê de bi dawî bûye de ji Welcome to Raqqa (Hûn Bi Xêr Hatîna Reqqayê) heye. Ev belgefilm li ser malpera webê ya Lawrence dikarin werin temaşekirin. Lê yê ku li Tirkiyeyê dikevin malperê, nikarin xwe bigihînin van belgefilman. Bi bikaranîna VPN'ê kes dikarin xwe bigihînin malperê.

(<https://joeylshop.com/>)
(<https://joeyl.com/portfolio/category/guerrilla-fighters-of-kurdistan>)

Pirtûka wêneyan

Têkildarî mijarê Lawrence dibêje ku ew ji têkoşîna kurdan a li Iraq û Sûriyeyê pir bi bandor bûye. Lawrence

diyar dike ku ew serfiraz e ku şahidiya vê têkoşînê kiriye. Di heman demê de Lawrence pirtûka wêneyan a bi navê We Came From Fire -Kurdistan's Armed Struggle Against ISIS (Em ji Agir hatîna Li Kurdistanê Li Dijî DAİŞ'ê Têkoşîna Çekdarî) jî amade kiriye. Ev pirtûk dê di adara sala 2019'an de bi awayekî fermî bê pêşkêşkirin.



Dê filma 14'ê Tîrmehê

guftûgo bikin

Dê îro cara dawî filma 14'ê Tîrmehê li Sinemaya Salim a Silêmaniyê were nîşandan. Piştî nîşandana filmê jî dê rewşên ber û derhênerên başûrê Kurdistanê li ser filmê guftûgo bikin.

Li gorî daxuyaniya Sinemaya Salim bername dê saet di 13:00'an de di çarçoveya projeya "Bi hev re ji bo dîtina film" Filmê 14'ê Tîrmehê were nîşandan. Her wiha wê di dawiyê filmê de komek nivîskar û derhêner der barê naveroka filmê de guftûgoyan bikin.

Nêzî mehek e li Sinemaya Salim a Silêmaniyê filma 14'ê Tîrmehê tê nîşandan û rastî eleqeyek mezin tê. Li ser xwesteka xwendekar û ciwanan nîşandana film hat dirêjkirin. Filma berxwedana 14'ê Tîrmehê 2 saet û 45 deqe ye. Li başûrê Kurdistanê bi jêrnivîsa Zaravayê Soranî tê pêşandan.

Filma berxwedana 14'ê Tîrmehê ku derhêneriya wê Haşim Aydemîr dike, li ser berxwedana kadroyên pêşeng ên PKK'ê, welatparêzên kurd û şoreşgerên Tirkiyeyê ya li dijî zilm û hovîtiya dewleta tirk li beramber girtiyên li zindana Amedê kirine, hatiye çêkirin.

Film rojiya mirinê ya berxwedana 14'ê Tîrmehê heya niha beşdarî çend mîhrîcanên filman ên navneteweyî û herêmi bûye û di çend qadan de jî hejariyê xelatê hatiye dîtin. Film di gelek mîhrîcanên navneteweyî de hat pêşandan. **SILÊMANÎ**



Bi zimanê xwezayê distrê

Ayşe Şewaxî li gundê Celedur a navçeya Pertek a Dêrsîmê diji, tevî zexta feodal a li ser, muzîk û kilamên xwe çêdike. Ayşe Şewaxî bi strana xwe ya "Baran Bari" hat nasîn. Ayşe Şewaxî bi dengê xwe yê xwezayî û ji dil a di al-



buma "Aşiqên Gel ên Dêrsîmê- Sarra" bal kişand bi albuma xwe ya nû "Şir û Kef" kêfxweşî û êşên gel tîne ziman.

Ayşe Şewaxî der barê destpêkirina muzîkê de axivî û diyar kir ku wê di temenê biçûk de ji sazê pir hez kiriye û wiha got: "Ez pir biçûk bûm, min stran digotin. Lê tenê mîran tenbûr lê dixistin. Ji bo jina qedexe bû. Guneş bû. Min ji bavê xwe xwest lê bavê min neanî. Min ji kir inat. Piştê bavê min anî. Min lê xist. Lê herî dawî ez hin bûm."

Ayşe Şewaxî bal kişand ser çanda feodal a li gund û wiha got: "Ji ber min li sazê dixist ez hatim şermzarkirin. Nedihiştin keçên wan bîna cem min. Ji ber vê min veşarî lê dixist. Min pêvajoya zehmet derbas kir. Tenbûra min wek zaroka min bû."

Ayşe Şewaxî di dawiyê axaftina xwe de bi lêv kir ku wan deman mezinên wan radyo guhdar dikirin û dema Ayşe Şan, Meryem Xan derdiketin bi bandor dibû û wiha dawî lê anî: "Min dixwest ez ji wek wan bêjim. Yekane xeyala min ev bû. Ez dixwazim kilamên xwe bi zimanê xwe bêjim. Yê ilhamê didin min çiya û xweza ne. Ez li çiyayan mezin bûm. Ez zimanê wan baş dizanim. Sira serkeftina min ji ji wir tê." **DÊRSIM**

Bi payîzokan şev geş kirin



Bi pêşengiya Chalak Eventsê li Tak-sîma Stenbolê ji bo biranina dengbêj Nesrîn Şerwanê du rojan bi beşdariya dengbêjên herêma Botanê şevbihêrka dengbêjan hat lidarxistin.

Dengbêj şeva ewil li salona Şa Performansê derketin ser dikê û şeva duyem jî li Şevîn Kafe derketin pêşberî stranhez û kilamhezan. Dengbêjan bi awazên payîzokan şevê li Stenbolê geş kirin.

Ji dengbêjên Botanê dengbêj Henîfa Şimexî, Kurdê (Kurdîstana Spêrtî), Cemalê Mihê û Evdilayê Goyî ku beşdarî şevbihêrkan bûn daketin Kolana Îstiklalê û wê kolana ji her bawerî, çand, netewe û zimani ku mirov lê hene, bê stran nehiştin û bi bilindkirina dengê stran û kolan şên kirin. Dema dengbêjan li Îstiklalê strana "Bejnê" gotin bala mirovan kişandin ser xwe. **STENBOL**

Li Kellarê pêşangeha pirtûkan

Li Kellarê pêşangeheke pirtûkan hat vekirin. Di pêşangehê de zêdetirî hezar pirtûk amade bûn û rastî eleqeyek mezin hat.

Pirtûkxaneya Giştî ya Kellarê bi alkariya pirtûkxaneyên Endeşê, Rênma û Hawraman pêşangeheke pirtûkan vekir. Pirtûk ji sedî 30, 40, û 50'ê nîrxê xwe kêmtir hatin firotin û heya 30'yê vê mehê dewam bike. Di pêşangehê de zêdetirî hezar pirtûkên siyasî, aborî, civakî, jin, helbest û gelek cûrên din hebûn. Pêşangeha pirtûkê bi taybetî ji aliyê xwendekaran ve rastî eleqeyek mezin hat. **SILÊMANÎ**

